Vekirin û danana berê binyatî bo çend pirojeyan li deverên cuda cuda li parêzgeha Duhok

Amadekirin: Mizgîn Doskî

Bi helkefta borîna 61 sala li ser damezrandina partî dîmokratî Kurdistan, li roja 21/8/2008 û bi amadebûna qaymqamê qeza Duhok û rêveberê nahya Mangêşkê û çend berpirsên hizbî û îdarî ev piroje li sinorê nahya Mangêşkê hatine vekirin û berê binyatî bo hindekên dî hate danan.

Danana berê binyatî bo rêkên navxweyî û solînên avrêj li senterê Mangêşkê, bi bihayê (106) milyon dînaran.

Vekirina rêkên navxweyî (6000) m 2 li nav senterê Mangêşkê bi kujmê (336) milyon dînaran, herdu piroje ji layê bajêrivaniya parêzgeha Duhok hatîne bi cih înan.

Vekirina pirojeyê avê li gundê (zêwka kendala) bi kujmê milyon dînaran, ji layê rêvebiriya ava gunda hatiye bi cih înan. Piroje ji kolana bîreka avê û danana umbareka avê û torên belavkirina avê pêkhatiye.

Danana berê binyatî bo avakirina umbarên parastin û tezandina fêqî li gundê hucava li devera Mangêşkê bi kujmê (469) milyon dînara. Biryar e di maweyê 210 roja bi dûmahî bihêt, ev piroje êke ji pirojeyên wezareta çandinê bo xizmetkirina berhemê cotyarên deverê.

Danana berê binyatî bo avakirina hola bîreweriyan li gundê dêrgijnîk bi kujmê (170) milyon dînaran, biryar e di maweyê180 roja de bi dûmahî bihêt.

Vekirina hola bîreweriya li gundê bêsifkê bi kujmê (157) milyon dînaran di gel kirîna kelûpelên nav holê.

Vekirina avahiyê gumirka Duhok bi kujmeyê (1) milyar û çar sed milyon dînaran.

Ji bo baştir xizmetkirina karûbarên gumirkî li sinorê parêzgeha Duhok li roja 23/8/2007 Reşîd tahir birîkarê wezareta darayî bi wekalet û bi amadebûna çend berpirsên dezgehên mîrî û bazirganî li parêzgehê,

avahiyê nû yê gumirka Duhok vekir, paş geryanek li nav pişkên avahî kirî û ji nêzîk bi rewşa avahî û rêkûpêkiya karûbarên gumirkî agehdarbûn.

Hejî gotinê ye ku avahî li ser budceya hukûmeta herêma Kurdistanê bi kujmeyê (1) milyar û (400) milyon dînaran hatiye avakirin, avahî li ser rûberê 2470 m2 hatiye çêkirin, ji sê qatan pêk dihêt, herwesa pişka dadgeha gumirkî û bngehê polîsan bi xwe ve digire. Piroje di maweyê salek û heşt mehan de wê bi dûmahî bihê.

Vekirina çaksaziya Duhok ya giştî

Li roja 30 /8/2007 temer Remezan parêzgerê Duhokê û bi amadebûna ceniral (wîzniskî) nûnerê hêzên fire regez li deverê, çaksaziya Duhok ya giştî vekir.

Paş geriyanek li nav pişkên çaksaziyê kirî û ji nêzîk sehkire berheviya wê.

Di rêûresmên vekirina çaksaziyê de, parêzgerê Duhokê peyvek pêş kêş kir, tê de supasiya hemû layena kir ku piştevaniya avakirina çaksaziya Duhok kirî û bi taybet hêzên Emirîkî. Birêzî got: Bê guman ev piroje wek u serboreka tazeye, ez bawer dikim ku ne li Kurdistanê û ne li Îraqê hebin û pirojeeykê nû û pêşkeftî ye pitir xizmeta wî xelkî dike yê ku dihête daddgehkirin û hukimkirin, ev çaksazî ye pêşkeftî ye û li dû têgehên dewletî hatiye çêkirin û êdî gileyî û gazinde na kevine ser dezgayên me yên polîsan û yên dî li parêzgehê, pitir ji12 milyon dulara bo hatîne terxankirin, nîva pareyî ji layê hêzên fireregez û nîva pareyê mayî ji layê hukûmeta herêma Kurdistanê hatî ye terxankirin, ev çaksazî ye cihê serbilindiyê ye ku bi rengekê baş û berfireh hatî ye çêkirin.

Avahiyê çaksaziya Duhok li ser rûberê (20) hizar m2 û bi du nihoman hatî ye avakirin, ji 92 yeka pêk dihêt û her yekeyek ji (8 -16) kesa dişêt bi hewîne, herwesa (7) werşên karî û pîşeyî û qutabxaneyeka (6) rêzî û bingehê saxlemiyê û mizgeft û holên werzişî yên corawcor di gel holeka aheng û bîreweriyan bi xwe ve digire sîstemê çavdêrî û zêrevaniyê bi rêka hijmareka kamîreyan dihête kuntiruolkirin, herwesa sîstemekê pêşkeftî yê hişyarî ya agirberbûnê lê hatî ye danan, piroje bi du qonaxan hatî ye avakirin, ya êkê ji sala 2000 heta 2002 û ya duyê ji sala 2006 ê heta bi dûmahî hatinê.